

# Seyranek dengbêjên nêv janan






**Helbestvan: LWÎZ ARAGON**
**Wergêran ji Frensî: Anahîta Hemo**

Û dema ji nû ve ez dest bi kar bikim,
Ezê di vê riyê re bixebitim.
Dengek hildikşe xurt tê guhê min,
û diaxive bona demên tên bi rêdene,
Em dibêjin ku di nav şane wê,
Du mirov wê şevê :"dilsare",
Ji vê jînê rawestiya-tu?
Dikarî bijî, tu dikarî bijî,
Dikarî bijî mîna me!
Bibêje gotina te min dihêle sermest
Û tu bikaribî bijî ji serxwe ta lingan..."
Û her û her dîsa ew karbû,
Ezê wî karî bikim,
Ew dengê ku hildikşe xurte,
Diaxive bona demên tên,
"Ne gotinek: Derî hêla,
Vebû û tu derket! Ne gotinek:
Zordar dest li ser hilanî
Sesame! Kutabûn gotinên te,
Ne gotinek ne derewek
Bona guhertina bê hêviya te,
Birame, hizir bike, birame.
Bi xweşbûna spêdê de...!"
-"û heger ev bû car dî kar
Car dî vê riyê ez dikim karê xwe,
Dengek hildikşe xurte,
Diaxive bi mirovên paşerojê re.